Erefatê Brahîmê Ezem

Yek ji kevintirîn xwendevanên kovara "HAWAR" ê Li Tirbespiyê dijî

Di kovara **RONAHÎ** ê de, hejmar 5- 1ê Tebaxa sala 1942an, Mîrê gewre **Celadet Bedirxan,** bendek bi navnîşana (**EREFAT kurê Brahîmê Ezem ji mala EMO REŞO an xwendevanê ber cot** ?) nivîsandiye, tê de, xîret û pesnê xortê nûhatî **Erefat** bi firehî aniye zimên, daxwaz ji mîr, beg û axayên kurda kiriye ku ew jî mîna **Erefat** guhdanê li zimanê dayika xwe yê şêrîn bikin.

Hesen axa, li ser hînkirina zimanê kurdî li **Cizîrê** weha ji **Mîr Celadet** re dibêje:(Wextekî min dersxaneyek vekiri bû û tê de dersa zarokan digot. Di nav wan zarokan de yek hebû, ji domanan, kurê **Brahîmê Ezem**, şagirtekî bi xîret û xebatkar bû, Carê ko ez diçim **Tirbespiyê**, **Erefat** hema ji min dipirse û dibêje: "Kanî **Hawar**, te ji me re **Hawar** anî?" û **Hawar** ji destê min digre û direve. Par, di wextê cot de ez dîsan çûbûm **Tirbespiyê** û di nav zeviyan de digeriyam. Çavê min bi cotkarekî ket. Ewî cotkarî tiştek bi destî ve hebû û ew tişt spî dikir. Bê hemtê xwe ez ber pê çûm. Ez çi bibînim **Erefat** e!, cotê xwe dike û **Hawarê** dixwîne. Min got-ê :"**Erefat** tu çi dikî". **Erefat** bêî ko serê xwe ji xwendinê rake gote min "Ma tu nabînî ez cotê xwe dikim û **Hawarê** dixwînim".).Vêca **Mîr Celadet** dibêje: "Kurdino! ji **Erefat** ibretê bigrin û bizanin ko mîr û axayên me yên ayendê yanî yên istiqbalê ew in, ew **Erefat** in ko kovara xwe li ber cot dixwînin û ne ew mîr û axa, beg û paşa.... yên ko xwe mezin dihesibînin, ji ber ko bi tenê û bi tenê mîr, axa, beg an paşa ne. Lê herçî ji nav wan weke **Erefat** kir, xwend û da xwendin û bi kêrî milet hat, mîrîtî an axatî ji wan re nabe bend ko ew jî li ber çavên milet qedirgiran bibin û li mezinahiya xwe a zikmakî mezinahîke rastîn, mezinahiya destexistî zêde bikin...".

** Apê Erefat, berî her tiştî em hêvî û tika dikin ku Xwedê temenê we dirêj bike, tendurustiya we biparêze. Hêvîdar in hun ji me re pêşî li ser rewşa xwendina xwe ya wê demê bipeyivin, bi taybet li ser dersxaneya **Hesen Axa**, ew li kûderê bû, mamosteyê wê kî bû, xwendekarên wê dersxaneyê kî bûn, çi ji wê qonaxê tê bîra we?.*

- Ez **Erefat ê Brahîmê Ezem** im, li gundê **Dêr Emerê**, kurdistana bakur, sala 1917-an ji dayik bûme, dema fermana **Haco** rabû, ez biçûk bûm, bi bavê xwe re em daketin binxetê.

** Ew dersxaneya **Hesen axa** li kû derê bû, mamosteyên wê kî bûn,* →